
helbest

XELÎLÊ DUHOKÎ



# *Gaziyek ji cergê Asya & Min digot û te vedigêra*

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Gaziyek ji cergê Asya
# & Min digot û te vedigêra

# Gaziyek ji cergê Asya
# & Min digot û te vedigêra

XELÎLÊ DUHOKÎ

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

**Xelîlê Duhokî:** Gaziyek ji cergê Asya

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Xelîlê Duhokî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-06-X

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Nêverok


Pêşgotin ........ 7

Ger mirim dê sava mînît ........ 11
Welatê min ........ 13
Kelekvano! ........ 15
Ez û heval ........ 18
Kaxezeka belavnekirî ya Gîvaray ........ 19
Gaziyek ji cergê Asya ........ 21
Evîna mezin ........ 23
Cejneka dî ya bi toz û kadî ........ 24
Agahdariyek ji bo civata gelên yekgirtî ........ 25
Têbînî ........ 27
Dosta bêwefa ........ 28
Narîn j' bo evînê d'kete girî ........ 29
Imperyalîzm û karekê nejêhatî ........ 31
Destana paleyekê kurd ........ 33
Şivan ........ 35
Kanî şoreşa nû ........ 36
Ya tu dixwazî ........ 37
Ev çi sal e? ........ 38
Nebêjin me çi jê ye ........ 39

Împeryalîzm û karekî nejêhatî ........ 43
Min digot û te vedigêra ........ 45
Dê bizivire ve ........ 47
Te çi vîya û min neanî ........ 49
Demê evîna welatî li ser textê dilê mirovî pal didet ........ 51
Şêlî nebûye kanîka li berê baday ........ 53
Demê azar û kova dibine ragirtin û pêşveçûn ........ 55

Evîneka nû û baweriyeka mukum . . . 57
Derebeg . . . 58
Kengî dê êy . . . 59
Me ji nû çêja jînê zanî . . . 60
Demê d'bînim . . . 61
Zalim . . . 63
Hîvî . . . 64
Ragirtin . . . 65
Dayê . . . 66
Ya ez dizanim . . . 67
Fener . . . 68
Nobedarê meh û salê . . . 69
Dibên narê . . . 71
Têhniya jê ra nemay av . . . 72
Tenyayî . . . 73
Dihî dihî . . . 74
Hejarîno . . . 75
Kî dibêt mirî . . . 76

## Pêşgotin

Sedan sal e çi ji layê sîyasî, komelayetî û aborî û çi ji layê roşenbîrî û edebî ve perdeka reş ji nezanîn û paşkeftinê li ser gelê me vedaye. Dîsan rûçik, rewişt û adetên kevin - yên kirêt û nejêhatî jî - mil bi mil di gel dijminên çînayetî û netewî, asteng kirîne di rêka pêşkeftina gelê me de û nehêlayîne bi dirustî qonaxa bibirît û bigehîte lok û pileyên bilind di jîyar û şaristanîyetê de. Her çende piraniya cûrên edebî û roşenbîrî nebûn û kehniyên wan di hişik bûn, lê kehniyên helbesta kurdî berdewam zayîne û bi helbestên xoragir û şoreşgerî têhna gelê me şikandî ne. Bi dehan stêrên geş, asmanê edebê kurdî ron kiriye, her ji Cizîrî û Nalî, Xanî û Hacî Qadirê Koyî û heta digihîte Goran û Cigerxwînî. Wan şairan bi peyv û ristên helbestên xwe, senger û çeperên dijminan têk di şikandin û gelê xwe hişyar dikirin û nebûne lêbok û yarên gavê, ji bo koçk û dîwanên derebeg, axa, şêx û dijminan.

Herçende bizaveka berdewam ji layê edîbên kurd ve hatiye kirin, lê di van bîst salên dawiyê de, wan piraniya rengên edebî û roşenbîrî geşe kirîne û bi taybetî helbesta kurdî ya hevçerx, ko pêş ve çûye û qonaxên dijwar û sext birîne. Bi dehan dîwanên helbestan, çi li Kurdistanê û çi li derveyî welatî, ronahî dîtîne û belavbûyîne. Piraniya helbestan basî derdeserî, hejarî, qaremanî û xoragirtina gelî dikin. Kiryarên çepel û kirêt ên dijminan berçav dikin û li dij radiwestin. Peyv mîna guleyan sîngê neyarê sitemkar disimîn û dibirîn, çinko peyvên şoreşgerî di şerê rizgarîyê de, kar û roleke giring dilîzin. Bi vî rengî nivîskar û edîbên kurd, nemaze yên bispor, zana û şoreşgêr xizmeteka mezin peşkêşî gelê xwe û gişt mirovayetiyê dikin..

Piraniya helbestên vê dîwanê, berî nuha di pirtûkekê de bi pîtên erebî, li Kurdistana Îraqê hatibûne çap kirin û belav kirin, lewra ne dûr e li hindek cihan guherîn peyda bibin. Lê min çendîn helbestên dî jî dayîne di gel. Mebest ew e ko hindek ji wana ronahî nedîtibûn û asteng û kospa,

rêka belavkirina wan girtibûn, çinko li Kurdistana Îraqê, ew azadiya me diviya û xebateka germ ji bo dikir, bi dest nedikeft û hukûmeta faşîst, hov û kevneperest, berdewam hewil dida ko rê nedite edebê şoreşgêr û xoragir belav bibit û bikefte ber destên cemawerî. Dîsan piraniya kurdên Kurdistana Tirkiye û Sûriyê nikarin bi pîtên erebî bixwînin û binivîsin, lewra wan nikarîne berhemên me bibînin û bisengînin. Herçende me zêde destkariya helbestan nekiriye, lê dîsa me bi pêdivî zaniye hindek guherînên biçûk di naverok û devoka helbestan de bikîn. Wek me gotî, ji ber nebûna azadiya belavkirina helbestên niştîmanperwerî û şoreşgeriyê, em pir caran neçar dibûn hêma (remza) bi kar bînin, nav û nîşanên helbestan biguherînin. Carna me şoreş dikire narîneka şeng û ciwan, carna jî me ji zar devê şoreşgerên cîhanê qise dikirin û namên pêşmergên qareman ji bo xoştivî, kes û karên wan dihinartin. Lê digel hindê jî me berdewam asteng dişikandin û dengê xwe digehande xelkê xwe yê bindest û derbeder.

Me berdewam hewil daye ko, xwendevanan tuşî tengavî û girêya nekîn û helbestên xwe ji tem û mij û giraniyê dûr kîn, çinko helbesta pirgirê nikarît xwe bigehînîte cemawerî û neşêt karekê baş li ser bikit. Me hewil daye, di gel bizava edebî û roşenbîrî biçin û carna jî pêş bikevîn, lê belê eger hat û kêmasî jî di zimanê me de hebin, sedem ew e ko dijminî ew qedexe kiriye û rê nedaye bajarvanî bigehîte me û ber bi pêş ve biçîn. Bawer bikin min û çendîn edîbên kurd, bi taybetî li Kurdistana Îraqê li devera Badînan, li çi xwendingeh û zanîngehên kurdî nexwandiye û nenivîsiye. Bi tenê me erebî û ingilîzî xwendiye û sûd ji serekaniyên wan wergirtiye. Lê bi xoragirtin û dilsojiya çendîn hêzên sîyasî yên kurdistanî , kurdên welatparêz û xemxorên welatî û peyva jêhatiya kurdî, şîyan zimanê kurdî ber bi pêş de bibin û bigehînin pileyên bilindtir.

Ez sala 1951-ê li bajêrê Duhokê li Kurdistana ko Îraqê dagîrkirî, hatîme dinê. Her ji zarokatiyê, evîndar û şeydayê çîrok, helbest, stran û serhatiyên kurdî bûm, mêvanê piraniya rûniştin û şeverokên taxa me bûm. Evîna folklorê kurdî yê zêrîn û bihagiran, keftibû di nav xwîna min de. Her ji sala 1970-ê min dest bi vehandina helbesta kiriye. Ya yekê min di sala 1972-ê de, di rojnama Hawkarî de belav kiriye. Di sala 1973-ê de, bûme endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd. Min di piraniya kovar û rojnamên kurdî de helbest, çîrok, gotar û vekolînên edebî, çi li Kurdistanê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û çi li derveyî welatî belav kirîne. Zilm, sitemkarî û sansora dijminî, ez neçar kirim ko di sala 1982-ê de, bigehime rêzên şoreşa kurdî..

Min pir pê xweş e ko vê qefta helbesta pêşkêşî xwendevanên hêja bikim, hêviya min ew e ko li cihê razîbûna wan bît..

**Xelîlê Duhokî**
20/11 1987
Eskilstuna - Swêd

## Ger mirim dê sava mînît

B’ das û bivr û xencera
Dest me hiland da ber sera
Welat evro zorbey kurda
Sîngê danay j’ bo çepera.
Hilnegire qehr û kula,
Bes e me û jan û kesera.
Soz bît j’ bo te pêk ve rabîn,
Sorgula geş kîn ji te ra.
Eger ez kewekê jar bim,
Pera li min biqusînin.
Çîçik û bilbil heval in
Dê di gel xwe min firînin.
Eger gula bê xudan bim,
Belga li min biwerînin.
Wekî buhara me d’ êtin
Gul dê di gel xwe min çînin.
Eger desta l’ min bişkênin,
Dê xebatê kim bi çava.
Çava li min kore bikin,
Dê dil mînit j’ bo bizava.
Welat ger wextekê mirim,
Neqehre dê mînit sava.
Ger min gavek havêtibît,
Ew dê havêtin deh gava.
Dê ji helbesta neqşînim,
Kirasa j’ bo hemû rîsa.
Dê helbesta kime xencer,
Pê dirînim zikên pîsa.
Dê kime pîş j’ bo hêlîna,
Bilbil biçine ser lîsa.

Ta ko rojek bêt j' bo kurda,
Zû biqetînin werîsa.
Kawe binive û xema nexwe,
Welatperês me tijî ne.
Zîndanên tarî çinînin,
Ne j' bo xweşiyê me bes jîn e.
Kul û kovan her bimînin,
Mem mir me Kurdistan Zîn e.
Me di dil xedeng tijî bin
J' bo rojeka nû çinîne.
Sond dixwim ez bi te Nevroz,
dî qet nexwin çi dev beş.
Bila ava şêlî bikin
Kurdistan e her gula geş.
Bila jîna me tal bikin,
Dijmin dê derkevin rûreş.
Dê gorî welatê xwe bim,
Ez bi ceger û dil û laş.

1973



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

# Welatê min

Welatê min
Ha j' xwe hebe
Ava bê pêl hêdî hêdî masiya dixwit,
Ew buhara gul bû di geş
Ew b' xwe dixwit!
Van dijmina îro divên
Sikra çêkin, coka bigirin
Me nebît av...
Tîra berdin me kore ken
Da ji me ra nemînin çav..
Goristana me xemlandî
J' bo şehîda wê bisojin..
Xort û mêr û tev egîda
Bi xafletî ew bikujin..
Kewê li ser gira diqebît wî bigirin,
Ezmanî lê ew bibirin..
Por û çîçka bêxne dava
Derên rika lê bigirin..
Welatê min
Kavlek im ez bê derge me
Da rêvînga bihewînim.
Ez nemînim
J' bo feqîr û tev hejara
Ez çi bînim..
Lê welato min divêtin
Rondikên dayka kom bikim
J' bo têhniya..
Goştê laşî jê ve bikim
Danim têşta tev birsiya..
Nobedarên dol û çiya..

Welatê min
Pirek im ez .
Min dest û pê şengiste ne
Dê her mînim..
Birîndara dê bûrînim..
Bibîne tu
Bibîne yê bi destekê
Di cengê da hate birîn..
Lê dê j' bo te xweş welato
Xwe gorî kîn û ragirîn..
Xwe gorî kîn û ragirîn..

1973


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Kelekvano!

Kelekvano!
Aveka boş e pirpêl e.
Me nehêle.
Evî qîtê me komkirî, wî lê bike.
Derbaz bike.
Ji destên dijminê neyar.
Bê birîn û paş bê hewar.
Kelekvano!
Were bibîne zarokê day lê mirî.
Gorî kirî.
Vê bîjina mêr lê nemay,
Şehîd kirî.
Birîndarê birîn evro lê kulkirî.
Kê sax bikim!
Kê ji pencên van dirinda rizgar bikim!
Lê nêzîk e difna dijmina b' kim bêder,
Ji dil cencerê l' ser bikim..
Kelekvano!
Kavlekê hey li ber girî,
Bê derge ye, ew yê me ye.
Hindek zarok tê de dijîn,
Şepirze ne!
Hêj biçûk in, çi nezan in ew yên me ne!
Zûbe vî qîtî b' gehîne.
J' destên xwînmêja derîne.
Hêj nû mal în..
Kêm heval în..
L' cem dijmina em çi nînîn.
Ya ji wan ve, em qaçax în..
Yan rêkgir în..

Em karwana di şelînîn..
Yan zaroka di qelînîn..
Ne we nîne
Ne bi gorên tev şehîda, ne we nîne.
Belê me d' vêt em jî bijîn,
Wek mileta.
Bes bimînîn li bin desta.
Kelekvano!
Bistanên me hişik kirin..
Av jê birin.
Zarokên me ser jê kirin.
Ev sorgulên bi xwîna me hatîn çandin,
Jinavbirin.
D' ser hindê ra we dibêjin!
Lê ya me d' vêt rojek nwî ye.
Buhareka xemlandî ye.
Gulên weryay sera rakin.
Ev hejare kolkên heriftî ava kin.
Me ev divêt, lew dibêjin
Kurd qaçax in.. kurd rêkgir in..
Kurd karwana dişelînin..
Kurd zaroka diqelînin..
Kelekvano!
Hindî kulyên xore hebin
L' nav genimî dirinde bin
Dê carna em jî birsî bîn.
Xudan kelem û stirî bîn.
Welê bila ew her hebin
Her mişe bin
Ew bi tinê dê rûreş bin
Demê rojeka nû d' êtin.
Zû dihelêtin.
Dê her êtin.
Kelekvano!
Rabûre, bêje cîhanê
Bêje cîhanê rastiyê.
Kî ne hevalên aştiyê û tenahiyê?

Bêje çi ne?
Kurd çi tuxmin?
Rast qaçax in?
Rast rêkgir in?
Yan divên mafa wergirin..
Dê wergirin.. Dê wergirin..

1973

# Ez û heval

Gewriya min.. Hinavên min..
D' hişk in delal
Ez yê li çoleka ker û lal
Her bê heval
Çi av têhna min naşkênin
Heta te çav d' rêka min de
Nebine kanîkek zelal.
Şev û roj l' min her şev in
Tarî ye û ez kêm dibînim.
Şahî û ewra l' min her tev in
Welê ez yê rêkên pirî,
Stirî û durik dişeqînim.
Dilezînim.
Da destên xwe
D' şenge bejna te werînim.
Têr bibînim.
Têr bibînim..

1973


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Kaxezeka belavnekirî ya Gîvaray

Hey cana min
Gava bîra te d'êt bi min
Jan û kovanên xwe, ji dil bivehîne..
J' min re b'şîne..
Hey cana min..
Demê l' govend û daweta
Xwe d'xemlînin. d'vehejînin.
Cerg û dilê te d'helînin
Li vêre canê
Ez yê çeper û xendeka d'herifînim
Zikên xwînmêj û nokera yê d'dirînim.
Yê d'peqînim.
Da rojeka pir xweşî û nû j' te re bînim.
Demê l' seyran û buhara xwe d'leqînin
Zerî serkêşên dîlana.
J' bax û bîstana d'derînin.
L' serê hemû kopên çîya
L' serên rêya
Dê min bînî, demê gurza d'veweşînim
Enya xwînmêjên welatî
D' herişînim.. d'perçiqînim..
Hey cana min
Kutirkek im şaperekê dê kim sîber
L' ser serê te.
Dilê xwe dê kime kanî l' ser rêka te.
Da jê vexwî gava diçî
Wan şînewarên pir birîn.
Demê Pepo l' ser digirîn
Hey cana min bawer bike
Gava desta dihelînim

Zend û baska dişidînim
Wek mîha l' ber devê gurgî
Pişta dijminî d'qirînim..
D' veçemînim
Hey cana min
Soz û peymana didem te
L' rojeka geş.
Wan çavên reş
D' kilî wer kim..
Wan birîna vekewînim ji dil der kim..
Ji dil der kim...

1974

## Gaziyek ji cergê Asya

Ho birayno
Rêvîng în em her bê çira!
Erê çira!
L' nîva şeva reş û tarî.
Heval û hogir me nînin,
Hilgirin harî me barî!
Ma dibîtin
Kutirkên me mişext bibin!
Hêlîna b' hêlin derbibin.
Werin evroke bibînin
Kelexên çîçik û pora,
L' çal û kora, evro rizîn.
Kevokên me, l' hemû nizara qirqiçîn.
Masî hatine daîran yan xendiqîn.
Lê birayno
Her çend kelek dar belav e
Rûbarek pir tor û dav e.
Lê me xebat û bizav e.
Çinkî gelo
Kewên me her yê diqebin..
Mahînên me hemî sihara dişihin..
Gulên me çandîn namirin,
Her digehin..
Bawer bikin, dê rojek êt,
Her çar qolaçên dilê me,
Geş bin. Vebin..
We diyar e tev dijmina ne li bîr e,
Yê ko evro şehîd dibît
Gorî axa pîroz dibît
B' serfirazî.. bi şanazî..

Gencekê dî
B’ tifeng û rexta radibît
Çinkî birayno ew bêhna,
Paşerojeka geş û nû,
Dihilkêşît.. di hilkêşît..

1974


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Evîna mezin

Di derya jan û kovana da şirînê,
Zivroka êş û birîna,
Ez vexwarim.
Lew hejar im.. Qet nikarim
Xwe berdem pêlên evînê
Nazenînê
Birîna min hêj kûrtir e,
Ji birîna Mem û Zînê
Hindî zaroka hewar bît
Qêre qêr bît j' ber nalînê.
Hindî sorgula tazî bît
Behî û şînî û her girî bît
Ji ber buhar û havînê.
Hindî rêka xort û mêra
J' mij û tozê dagirtî bît.
Keproka bê kes û jara heraftî bît.
Qet nikarim
Xwe berdem pêlên evînê.
Ay şirînê. evîna min,
J' evîna te kevintir e..
Mezintir e..
Bi hêztir e.. Germtir e..

1974

# Cejneka dî ya bi toz û kadî

Careka dî
Cejna me zivirîve canê
B' toz û kadî.
Kanê ya dî!?
Evca bes min
B' soje û girkê xema kom ke,
L' ser vî dilî!
Bes min b'kuje û bes tu xwînê,
L' çava bide l' şûna kilî!
Were, were, sotim helyam
Ha şemalka şenge jîna min vemirî.
Genmê li zevya jîna min,
Ma ne durî!
Buhara min ya d'kit girî!
Were, were, xweş ke jînê.
Da nekevîn derd û xemên,
Mem û Zînê.
Gêleşûka evê jînê.
Evê jinê..

1974


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Agahdariyek ji bo civata gelên yekgirtî

»Piştî pezî serjêdikin,
Digurên û kevil dikin.
Lê evroke l' welatê min,
Berî mirovî bikujin,
D' zîndana de kevil dikin..« (1)
Erê gelî daxaskerên serbestiyê
Yên aştiyê û tenahiyê
We dîtiye?
We dîroka gelê me jî bihîstiye!
L' welatê min, ker û golika,
Gêre d'kirin.
Nûha d'zirin.
L' gelyê Zîlan (2) û Çarçira(3)
Hizaran xelk, bin ax kirin.
Hêşta d'nirin.
L' sorya (4) û Deka, (5)
Sotin, gulebaran kirin.
Zîndan d' pirin.
Lê xelkê me,
şenge doza xwe bernedan,
Xendek, çeper çolnekirin.
Pa dê werin!
Hûn l' çi digerin!
Xwîn ya pengî.
L' kîrê û kengî,
Zikê jina avis bi şert,
D' êt dirandin?! (6)
L' kîrê û kengî,
Mirov b' saxî d'êt veşartin?! (7)
L' kîrê û kengî,

L’ şûna dîyariyên sersala,
Napalm û top,
J’ bo zaroka d’ên hinartin?!
Lewra gelo
D’ nav kelexên mirovan de..
D’ nav daristanên sotî de..
D’ nav xanîkên heraftî de..
L’ azadiyê ez digerim.
Her ya fere pêş de herim.
Bi bawer im.
Rojeka nû wê j’ me ra bêt.
Buharek û kanî bizêt.
L’ serê gir û kupên çiya
L’ serên rêya
Agirekê geş hilbikîn.
Kurdistanê bi xemlînîn, himbêz bikîn.
Nevrozekê ji dil bikîn.
Cejna hewe û xelkê jêrdest,
Pîroz bikîn.
Pîroz bikîn.

1974


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Têbînî

Destkariya vê helbestê hatiye kirin, hinde rûdanên din jî çûne di nav rêzên wê de.

1) Ji helbestvanê ereb Ebdulwehab Beyatî hatîye wergirtin.
2) Li geliyê Zîlan, hizaran xelkê bêdeselatê sedan gunda kom kirin û di vî gelî de bi destên cendirmên tirka hatine bombe barankirin û şehîd kirin, dibêjin: rûbarê di gelî de diçû pir xwîn bûbû.
3) Çarçira, di vê meydanê de, serokê Komara Muhabadê, Qazî Muhemmed û hevalên wî bi destên rijêma Şahê çepelr hatine bidardakirin.
4) Sorya, gundek e dikevîte devera Badînan li nêzîk bajêrê Zaxo. Li sala 1963 ê hukumeta faşîsta Îraqê, gişt xelkê gundî, ko ji feleh û musulmanên kurd pêk hatibû, hemû gule baran kirin
5) Deka, şikeftek e, dikevîte devera Badînan nêzîk bajêrê Şêxan, gişt xelkê gundî ji ber top û firokên hukumeta hov revîbûn û çûbûne di şikeftê de. Lê kirêgirte û leşkerê holakoy agir berdane şikeftê û hemû tê de şewitandin.
6) Di sala 1963-ê de, jineka kurd kefte destên leşkerê Îraqê, ji ber ko jin aviz bû, lewre şertanê kirin da ko bizanin, ka jinê kur heye ya keç!! Hovane armanca xwe cê bi cê kirin.
7) Di sala 1963-ê de, li bajêrê Silêmaniyê ji heştê mirovan pêtir girtin û bi saxî havêtine di çaleka kûr de û veşartin.

## Dosta bêwefa

Dosta minê, ho hevalê.
Hemî salê
Babelîsk û barovên te,
Gef dikirin.
Xem dihêlan,
Xweşî d'birin!
Hingê dostê,
Hêviyên min, hemî d'mirin.
Koz û nizarên laşê min,
Her ew in yên ko te sotîn
Dîsa l' kîrê te divêtin
Kar û berxên min biçerin!
Here. Here
Min nedizanî d' mejyê te de
Direw d' pirin.
D' gera xapandina tê de,
Heval d'mirin.
Mirov d'mirin..

1975


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Narîn j’ bo evînê d’kete girî

Gelo narînê girîn e,
J’ ber evînê.
Gelo bêjnê,
Yê ko j’ bo evînê d’jîtin.
Caran b’ xweşî. caran hey ho,
Dê b’ azar û kovan bîtin.
Caran evîn,
Mîh û karên şivanî pê
Can bêrî viyay,
D’bete çerwanî l’ nizara.
Caran d’ havêtin ber devê,
Gurg û hara.
Caran sikra j’ xwîna dila dipengînît.
Caran buharê l’ ber dilê,
Şenge tolaza d’ xemlînît.
Caran birîna kûr dikit û d’arînît.
Caran stiranên xweşîyê
J’ bo evîndara d’lorînît.
Evca narîn, j’ ber evînê,
D’ key girînê!
Ne tu b’ tinê b’ jan û kul î!
Tu b’ wî dilî, pişkek kul î.
Lê evro ez û yê evîna j’ dil kirî.
Yê laş lê hati kelaştî û
Pirt pirt kirî.
Yê ko piştî,
Hizar rim û tîr vêketîn,
Hêj evînî j’ bîr nekirî.
Nexêr, nexêr nakîn girî.
Evca tu jî.

Bêy girîn û bêy xwe b' kujî.
J' bo evîna giran bijî.
Narîn bijî û her bijî..

1975


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Imperyalîzm û karekê nejêhatî

Ev ne xewn e.
Ne destanek gelek kevn e.
Lê rastî ye û min dihêrît
Lew min divêt êk vegêrît
Ay xelkîno
L' warekê bê kes û xudan
L' çolekî hişk bê av û nan
Min dida rê.
Ax ji wê rê!
Stirî û heja,
şerenîx bû d' gel hir û bay.
Qêrî û nalîna mirovan,
Hirêna ewr û birîsya j' dil çik dikir.
Toza j' gevizîna birîndara radibî,
Çavên dûkêl û kadiyê kore dikir.
Lê xelkîno, l' ber wê hurê
Min jî da rê

Lê hêşta j' rê qonaxek may.
Acûc û macûcên nemay, xirbûne ve.
Min dest û pê kiribûn stûna pira kara,
Lê j' bin birin û şikandin.
Çavên di geş
Çirayên şevreşa jara,
Ay bi kêra qoqilandin.
Sîngê min jî,
Germe hêlîna sêwî û birîndara,
Bijikandin.
Pişta min j' nîvê qirandin.
Evca hindabûn û firîn.

Piştî nêçîra xwe kirîn.
Ez b' wî rengî
L' rex û çanên laşê min xwîn
Gerek pengî
Welê kengî!?
Kî heye j' bo tev hejarên,
Vê cîhanê, çîroka min j' dil vegêrît,
Hêy ne jengî.
Hêy ne jengî...

1975


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Destana paleyekê kurd

Ho birao.
Sîng pîlao.
Weku niha, bîra min d'êt,
Dema tu hatiye karxanê,
B' zikê vala û zaro d' birsî.
L' te jî d'xurîn, here, here,
Kî dizanît tu çi kesî!?
Hingê kekê jar min zanî,
Tu jî mîna min bê kesî!
Tu çi d'xwazî, tu l' çi d'pirsî!
Erê ma te ne li bîr bû,
Deme volkana Bêkesî (1)
Peqî û digotî bê tirsî:
»Bîst û hewt sale min rêncberî tum,
Be nan û aw û cil û bergî xum.
Xizmetim kirdî le Îran û Rûm
Le pênawî tu şikawe estum...«
Lê birao. Sîng pîlao.
Weku niha bîra min d'êt
Gava te çav bûyne dû stêr.
Te deng bûye hurmênek û
Tû bûye şêr.
Rast te gotî:
Ez pale me.
Barê min tev cara xem e.
Mera min j' bo zile çavên tev dijminan,
Kêr û çeqok û kelem e.
Bizava min ya herdem e.
Her ya fer e xwe hişyar kîn.
Zilm û sitem karyê rakîn.

Lewra min d'vêt
Gurg û rîvya rateqînim.
şêr û pilingên meydana,
Vezivrînim gêrê dîsa.
Kew û kevok û mirîşka,
J' mişextbûnê vegerînim,
Carek dî hêlîn û lîsa.
J' tev kaniya,
Ramalim kirim û zêriya.
Gewriyên jar û têhniya
J' qirqiçînê, j' hişikbînê.
Av bidim carek dî dîsa.
Bipeqînim, bidirînim.
Genî zikên noker û xwînmêj û pîsa.
Lê birao
Sîng pîlao
Taca serê tev jarao
Min hind dît tu l' min berze bûy.
Lê ker nebûy.
Bê deng nebûy.
L' hemî layên asmanî dengê te veda,
Gelê bê deng û ker û lal,
Nekin zaro b' mînin birsî..
Ne çi jîn e ya ko dibûrît bitirsî..
Ne çi jîn e.. ne çi jîn e..

1975

Helbestvanekî bi nav û deng ê Kurdistana Îraqê ye.

## Şivan

Ho şivano
Min li bîr e û min yê zanî
Kanê çewa, ho b' bê dengî!
B' devê gura,
Pez mir û xwîn l' dûr te pengî!
Lê ya fer e, careka dî,
Mîh û kara.
Xirkeye, zom û nizara.
Çinku dibên:
»Serbilindî ne her hinde,
mirov çi cara nekevît.
Belku hinde, demê d'kevît
careka dî
rabît û ji nû bibezît.«

1975

## Kanî şoreşa nû

Rabe bira
Ala xebatê biçîne l' hemî dira!
şemalkên şoreşeka nû,
Ya me divêtin helke ve..
Bibe lehî,
Hemî sikra bipeqîne
Careka dî nivistiya hişyar ke ve..
Bêje kanê?
Leşkerê mîna birîsyê,
Yê fer e dîsa bête ve..
Bêje bo çi hûn d' bê deng in?
Werin gurga rateqînin.
Da bes xwîna kar û berxa,
L' welatê min bête rêtin!
Werin buharê b'xemlînin.
Da bes bêhna gula b' dizin,
J' evro pê ve bo me bêtin!
Nanê sêlê her yê me ye
Dîsa bo me bête pêtin!
Kanî bo me bête zêtin.
Rabe bira,
Ala xebatê biçîne l' hemî dira.
L' hemî dira..

1976

## Ya tu dixwazî

Hey ho canê ya tu dixwazî..
Min jî gelek l' dwîf d'kir gazî..
Lê ew hêvî,
Kevn e ya par û pêrar e.
Tu bizane j' îsal pê ve,
Evîna şenge welatî
L' ber derazînka dilê min nobedar e.
Ji serekanya mejyê min
Heta dawiyê bi kare.
J' dil bijar e.. j' dil bijar e..

1976

## Ev çi sal e?

Gelo gelo, ev çi sal e!
Ev çi tazî û nale nal e!
Erê hemî çira û fener
J' bo çi ne ew
Ger şeva me j' dil ron nekin!
Erê hemî şêr û pilingên meydana
J' bo çi ne ew
Ger rêka me
J' dehbe û dirindên zaroxwar
Pakij nekin!
Erê hemî ev xort û genc
J' bo çine ew
Ger hêviya me
Nêzîk nekin!
Me nevên gul di weryay bin.
Me nevên mêr
Di tirsay û paşvemay bin.
Me nevên şêr,
Gêj û şepirze û damay bin.
Me nevên çi bi vî rengî..
Bi bê dengî..
Me divên mêr, me divên şêr.
Ku tev bi hev
Di rêka rojeka nû de,
Xwe gorî kin.
Xwe gorî kin...

1976


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Nebêjin me çi jê ye

Bajarê min b' toz û mij e.
Çîroka min,
Mîna destana stêra kerwankuj e.
Kî ne evro b'kine gazî,
Ho dijmino,
Bes kal û zaroka b'kuje!!
L' ser kelexa
Bes bikene û bes b'girnije!!
Ay xelkîno!
Pisyar bikin!
Kanya xweşya bo l' me nazêt?
Buhara deyka kulîlka çira naêt?
Gencê j' bo rojeka ûsan evro gehî,
Bo çî xwe gorî nakit û lawka nabêt?
Ay kurdîno, xwe hişyar kin!
Çi çilxane ye hûn tê de?!
Erê ma kes nema d' rê da?..
Bes vegerin û bes bêjin,
Me çi jê ye!!
Yê l' ber pêlên derya ho har,
L' lavelavê şenge hêvî,
D' gel kenarê tenahyê ye.
Birsî çav l' nanê sêlê ye.
Zaroy çav l' şîrê daykê ye.
Bes vegerin û bes bêjin
Me çi jê ye!!
Xebat ne bes carekê ye.
Kerwan ne bes
Kerwanî yê her şevê ye.
Me jivanek d'gel rojê ye.
Ç av me lê ye..
Çav me lê ye..

1976

# II

# Min digot û te vedigêra

## Împeryalîzm û karekî nejêhatî

Ev ne xewn e.
Ne datstanek gelek kevn e.
Le rastî ye û min diherû
Lew min divêt êk vegêrit
Ay xelkîno
L'warekê bê kes û xudan
L'çolekî hişk be av û nan
Min dida rê.
Ax ji we rê!
Stirî û hela,
Şeremx bû ďg e1 hirr û bay.
Oerî û nalîna mirovan,
Hirrêna ewr û birîsya j'dil çik dikir.
Toza j'gevizîna birîndara radibû,
Çavên dûkêl û kadîyê kore dikir.
Le xelkîno, min jî da rê
L'ber wê hurrê
Lê hêşta j'rê qonaxek may.
Acûc û macûcên nemay, xirrbûne ve.
Min dest û pê kirbûn stûna pira kara, j 'bin birin û
Şikandin.
Çavên di geş
Çirayên şevrreşa jara,
Ay bi kêra qokilandin.
Singê min jî,
Germe hêlîna sêwî û birîndara
Bijikandin.
Pişta min j'nîvê qirrandin.
Evca hindabûn û firrin. Piştî nêçîra xwe kirîn.
Ez b'wî rengî

L ‘rex û çanên laşê min xwîn Gerrek pengî
Welê kengî!?
Kî heye j’bo tev hejarên
Vê cîhanê, çiroka min j’dil vegêrit,
Hey ne jengî. Hey ne jengî

1975


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Min digot û te vedigêra

Narîna min
Min digot û te vedgêra!
Min di gotî: Jiyana min
Biyabaneke têhnî ye
Qirrqiçî, hişk û bê av e!
Te digotî: Min xwîn av e!
Min digotî: Asmanê min,
J 'mij û mûranê girtîye û bê hetav e.
Te digotî: Çavê min roja 1' hindav e!
Min digotî: Sorgula min,
Çirmisî ye û bê xonav e.
L 'nexşeya şenge buharê,
Y a bê nav e.
Te digotî:
Ez im nexşey divehînim wê ji te ra ev silav e!
Min digotî:
Qonaxa min
Rêkeka pirr stirî û dav e.
Te digotî:
Min ji bo hindê bizave!
Hey Narîne!!
Pa ka dilê lîsê cara?
Ka ew sîngê derya mezina
Dildara evîndara?
Ka ew axiftinên şirîn
Te vedgêran bo me êxsîr û hejara?
Kanê? Kanê?!
Her ho zûka
Te armancên xwe j'bîr kirin!
Te tev hêvî û omêdên min

Serjêkirin!
Ere naête bîra te, wek te digot:
Payîza te dê kim huhar û xemlînim,
Sed hezar dermanên bijar,
De 1'birînên te werînim!
De te ji derya kovana,
Oortalkim û zû derîmim!
Pa te bo çî ev agire berda dilî!!
Ew buhara te digotî nexemilî!
Le Narîmê
Ger careke dî tu hatî
Dîsa te vîya evîmê b'kî.
Hay xwe hebe, kurkê nezanîn û fêla,
Nekî ber xwe û dilên nazik
Pirr kovan û axînk nekî!
Baxê Êrem kavil nekî!
Da navê te 1' ser dilê min bêt çap kirin.
Sexmeret hêvî û armanca,
Xwe bideme gorî kirin...
Gonkirin....

1976


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Dê bizivire ve

Narîna min tu çi d'bejî!
Ta kengî tu, xwîne j'dilê min dê rêjî!
Narînê bes xwe gîroke!
Jîneke pirr gêleşok e.
Ax û sed ax j've evînê.
J' vê dûrbînê.
Ev evîne
Mîna agirê l'nav pîşî!
Min d'qelînît!
Mîna fîşeka tifengê,
Min d'simînît!
Bes xwe gîro ke b'zivrre ve.
Vî dilê j' êşa çirmisî
Tu geşke ve.
Dê b'zivrre ve.
Hişke sorgulên kuzirî
D' gulistana çavên min de
Av bide ve.
Tev xîvetên
D'şenge konê dilê min da bijalebîn,
Tu komke ve.
De b'zivrre ve
Serkanya hinavên min,
Da b' zête ve.
Kewrobadên,
Kevr û helanên laşe min,
Da b' xwînne ve.
Narîna min, ez dizanim
Beko neşyan,
D' nav darristanen evîne da

Te b'sojin.
Yan di derya kerb û kînê da te b'kujin.
Bawer bike
Hindî hizir û bîr min hebin.
Jan û kovan dê j'te revin.
Hemû beko û kirêgirtî,
Dê qorban û gorî te bin.
Dê qorban û gorî te bin...

1976


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Te çi vîya û min neanî

Narîna min, hey hogirê.
Hogira tev dem û gavê.
Çima îroke azirî
Tu l'min nakî çi silavê!?
Ke gote te,
Ne çe çi nêçîr û ravê!
Evîna vî lawî pavê.
Neçe... Neçe
Te çi daxwaz kir min nekir!
Ger te roj vîya û
Min j'te ra roj neanî!
Ger te (şîrê şêra...) vîya
Min neanî.
Ger te vîya, wek Ferhadî,
Ez j'bo te kunkem çiyakî,
Min nekarî û min nezanî!
Hinge min b'hêlî hejî me.
Neçe... Neçe .
Ger te gotî:
Birsî me û birsa te Narê,
Goştê min bû.
Têhnî me û têhna te Narê,
Xwîna min bû.
L 'şeva tarî,
Çirayê rêka te Narê,
Çavê min bû.
Min nekarî û min nedanî.
Hîngê min b'hêlî hejî me..
Neçe... Neçe
N arîna min, ez dizanim

Ev xwezî ne û
(Kes bi xwezî ya nagehte baqê kezî ya)
Lê xwezî yên min hêvî ne û hêvî yên min
Omêda rojeka nû ne...
Omêda rojeka nû ne...

1976



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Demê evîna welatî li ser textê dilê mirovî pal didet

Welatê min
Min tu ď'vîyay b'wan dest û pên,
Pirr bi xwînê xena k.irî.
B'wî sîngê mîna çîyakî,
B'rum û tîra nîşan kirî.
B'wê birîna satorê xwîn,
Lê pengandî û tijî kirî.
L'deşt û çolê.
L 'kela tu lê.
L 'heçî cihê ko ho tu lê.
Min tu ď'vîyay.
Û niha jî min tu divêy,
Wek şivanê sotî û heyranê bilîla,
Ketî û şkestî.
Wek nêçîrvanê l'nêçîrê,
Tajî û tîlek
Dehbey havêtîn ber destî,
Wek (Siyabendê) l'ser ranê,
Şenge (Xecokê ) nivistî.
Wek mîha j'ber devê gurgî,
B'şev verristî.
Min tu divêy û hêj divêy.
Wek babelîsk û hirr û ba,
Kepr û konên
Piz û zarokên warê te ď'herrifînin.
Min hêj di vêy. Wek siyarên,
Zordarî, kotek û zulmê,
Her roj gêrê û geleşokê,
D'mêrg û zoma warê te da
D'ken û ď'rînin. Min hêj divêy.

Wek gurîya sitemkarî û bêbextîyê,
Rîs û melok û gidêşen,
Pirêz û zevyên warê te, ď'şewitînin.
Min hêj divêyl.
Wek qirrî û nalîna te ď'êt, ko qirr û kund,
Goştê laşê te ď'qewrînin. Min hêj divêy.
Ay welato j'vê evînê.
Ne day û kurr, mîna dibên hind êk divên
Çinku welat te ew deng e. Te ew reng e.
Te ew deng e û te ew reng e...

1976


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Şêlî nebûye kanîka li berê baday

Şoreşvano!
Rêvîngo dil pirr kovano!
Me hemya jana te zarî.
Kanê çewa j'bê xwedarî.
Mahîna te l'rê rawista û vecinqî.
Cerkê avê,
L 'germ û gurra deştê peqî!
Gulle û fîşek,
D'kela şerî da neteqî!
Şoreşvano!
Şeydayê torîna bisk û kezî baday
L 'hemî tengavîya beje: Omêda may.
Şêlî nebûye (kanîka l'berê baday)*
Lezê bike,
Karwanên mileta çûn û tu b'tinê may!
Bawer bike hêşta gul ne çirmisîye,
Ya b'binêve.
Ewrên barana xwe dan êk,
Hatine hêve û çûne wêve.
Heval jî nerawestaye,
Yê b'lez e û dîsa yê b'rêve.
Şoreşvano!
Hey ho lawê xewna dirêja gişt şevê.
Hêşta em mîna şanêyne û
Neketîne gêleşoka,
Derdê revê.
Neketîne û qet narevîn.
Ger ketîn jî, dîsa d'bezîn..
Ger revîn jî, dê vegerîn.

1977

* Demê nanek ji xwarina nokerê Xanê Lepzêr kêm bûy, wî serê xwe çemand û kete gerra xiyanetê û serekanîya (kanîka li bin berê baday) ya ko di gehişte nav kelê, nîşa leşkerê Şahî da, evca dijminî se , ker û golik di nav da vekujtin û kanî pirrî xwîn û pîsatî kirin. Lewra neçar bûn ji kelê derkevin û şerî bikin. Lê neşîyan xwe li ber hêzên mezin û çekên giranên wan ragirin Û pirranîya xelkê şehîd bûn. Kel jî kete destên dijminan. Dîrokê jî berperên reş ji bo xaînî nivîsîn û yên zêrîn jî, ji bo şoreşgêr û qaremanan xemlandin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Demê azar û kova dibine ragirtin û pêşveçûn

– Ho şairo,
Hizra neke, bîra neke.
Êş û azar û kovana qet raneke.
Te çîye l'bin bare xema! Ere ma bo te negotin,
Armanca te dûre û dibêjin,
Mir nema!
Evca bo kê, stiran û benda tu dibêy!
Kê hay li te ye û kê tu divêy!
-Ay xelkîno,
Werin bibînin vî karî.
L'vi welatê, Xweşî lê nebûy diyarî.
Ger hûn nebin,
Kî dê îro ête harî!
Ev zarokên j'nû gehiştîn,
Kî dê j'hova rizgar ket û
Bete ser rêka rastîyê!
Siyarê canî mahîna l'germ û gurre,
Şeqandî rê,
Çewa b'gehîte wê omed û hîvîyê?
Karwanê j'mêje dayî rê,
Car peşketî û car paşvemay,
Kî dê gehînte qonaxa dûmahîyê?
Ay xelkîno!!
Bawer bikin.
Ez hizir û bîr û kovana,
L 'havîna d'kim,
Tavyên baranê û av didim,
Zevî û cinîkên hişkkirî.
Ez hizir û bîrên xwe d'kime,
Gulle û tifeng

Bo zarokê hêj di zik da,
Dijminî bab şehîd kirî.
Ragirtin û peşveçûnek,
Bo her kesê, j’ber ketnekê,
Hîvî û daxwaza xwe hêlay û j’bîr kirî.
Ez hizir û bîrên xwe l’beroka tev şera,
D’kime xendek,
Bo te pêşmergê qareman,
Evca çewa dê paşve êy û zivirrî! !
Dê bide rê.
Ez dizanim, ger te da rê.
Heçî mirovê nivistî.
Yê j’neçarî,
Kurkê xebatê êxistî.
Yê mejî lê hatîye hêray.
Yê xwe l’delîvekê hêlay.
Dê derkevin û sînga kene,
Çeperekê mîna pîlay.
Dê bide rê.
Dê bide rê û paşve neê.
Paşve neê...

1976


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Evîneka nû û baweriyeka mukum

Şirîna min
Hey torîna ji min dilmay!
Raste ez bûm yê direwîn,
Yê ko ho meji 1 ‘te hêray .
Wele canê
Ger buhara ev sale jî,
Hat û dîsa tu b’tinê may.
L ‘jîna pirr jan û derd û xem,
Ez cûm û dîsa b’tinê may .
L’i şeva bokînya te canê,
Min tu firotî û erzan day!
Hej min neke û
Bila kezyên te bo min bibine sêdare û,
Xelk û cîran bêjin, Tif kine vî zavay .
Bawer bike
Demê b’gêsinê kovana,
Şenge laşe te min kêlay .
Paş min zanî,
Cergê min sot û kuzirî û
J’nû min qêrkire stirana,
Ay day. Ay day.
Şirrkên xwînê, j’dilê min rêtin û,
Her ez mame vemay .
Zivrîme ve...
Zivrîme ve û evê carê,
Evîn ya ď’mejyê min da zay.
Sed car soz bît te nehêlim
Dîsa şepirze û damay.
Xwe gorîkim,
Êdî we nekim bêjî ay.
Êdî we nekim bêjî ay.

1977

## Derebeg

Derebega l'ser rûbarê,
Gundê min sikir çêkirin.
Hizir kirin.
Tev cinîk dê j'têhnê mirin.
Lê j'bîr kirin.
Ku li dûrên şenge gundî,
Kanî d'pirr in.
Kanî d'pirr in.

1977


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Kengî dê êy

Şirîna min
Bêdengîya te, kovaneke gelek kûr e!
Hindek dibên hatina te,
Omêdeka êkcar dûr e!
Lê şirînê
Demê nexşa rşeçavên te dixwînim,
Birîn kit kit, j'laşî d'kevin
Demê perda kerrbûna te dihelînim,
Azar min d'hêlin û d'revin.
Lê nuzanim
Bo çî hêdî hêdî diêy?
Hey kanîya evê jînê,
Çirra pîç pîçe tu dizêy?
Ax tu d'zanî
Min çend tu d'vêy!
Zû be bêje,
Kengî dê bî lafaw û êy?
Kengî dê êy? Kengî dê êy?

1977

## Me ji nû çêja jînê zanî

Gava tu hatî şirînê.
Şahî û dawet,
Kete nav qada birînê.
Xirrbûne ve geşestêrên evînê.
Rateqandin mij û dûkêla,
Girtî asmanê jînê.
Şirîna min
Zarokekî jar û bêkes û birsî bûm,
Wek tu hatî,
Birsa min şkest û b'dîtna te,
Terbûme ve.
Birîneka Kûra pirr pêt û gurrî bûm
Wek tu hatî
Tev vemirî û saxbûme ve.
Kutirkeka nemrî nemay û tawî bûm,
Wek tu hatî
Girrnijîm û firrîme ve.
Şirîna mİn wek tu hatî,
Min j'nû barê xema danî.
Min j'nû j'wan lêvên te çela,
Jînê zanî.
Min j'nû zanî, dilkê b'evîn,
Ne nîşana çi tîra ye.
Ne derya jan û xema ye.
Nexêr. Nexêr.

1977



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Demê d’bînim

Deme d’bînim
L ‘ çar kinarên vî welatî,
Jin û pîr û zaro d’livin.
Çavên xurta
D’bine derya û jê difirrin,
Geşeewr û baran d’kevin.
Stiranên tazî û şînîyê
Bo lawkekê mêranîyê
D’bin awaz û şengetevin.
Ez xwe d ‘bînim
Hej gencekî çarde salî û
Gurg û dirrinde j’min d’revin..
Erê d’revin.
Demê d’bînim
Qolên genca ber bi sîngê,
Welatî d’ên.
Soz û peymana b’cê d’înin,
Ne bes dibên.
Dîsan bêrî, meşka dikên.
Şivanên gundê me,
Lawk û heyrana d’bên.
Axînk diçin,
Sed hezar kiryar û hinêr,
J’ dilên dayik û xwîşka dizên.
Û her dizên.
Demê d’bînim
L ‘zîr û girên vî welatî,
Buhareka xemlandîye,
B’gul û nêrgiz û çîçeka.
Hêlîna vala ya pirrî bûy j’têşika.

L’ qada gundê me ji bira,
Govendeka girêdaye
J’şenge xurt û çavbeleka.
Dilê min yê b’ çend rexa ve,
Bijale buy,
Her wekî darên keleka.
Xwe d’dete êk û d’kevîte
Livîn û yarî û heneka.
Lê xelkîno, demê d’bînim
Tank, zirîpoş
Reza d’sojin, avahîya d’herrifînin,
Revdên gurga,
Zarokên me d’bijikînin.
Demê d’bînim
L ‘ tax û qadên
Bajar, gunda
Xurt û law d’ên b’darvekirin.
Jin û dayik
D’ ordugayên faşîyan da,
Her roj d’êne kirêt kirin.
Demê ev rûdan û birîn,
Hemî d’êne ji bîr kirin!
Hîngê gelo
Singê min yê mîna çîya
D’ êt kunkirin.
Lê ger dermanek hebîtin,
Birîn diêne sax kirin.
Birîn diêne sax kirin.

1977


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Zalim

Ho zalimo
Ger te şîya laşa b'gurî.
Mina qefta gîyay dest û pêya b'durî.
Bawer bike,
Dê b'wê kovanê tu mirî.
Çica neşey,
Hizra b' kirrî.
Bîra b' kirrî.

1977

## Hîvî

Ger carekê
Bîra te hat û te vîya
Tev hîvîya
Nû key û rakey j'bin pîya.
Dîsan yarê
Dê bim buhar û girrnijim.
Çîyê tibla xwe dirêj kete bejna te,
Dê bim volkan û wî sojim.
Dê wî sojim.

1978

## Ragirtin

Erê bira te zanîye,
L 'hindek qolaçên cîhanê,
Qazanên xwrna zarokan
D'tijî ber in! L'zîr û gira,
Gîya bijar e û buhar e,
Lê kar û berxên hejara, lê naçerin!
L'cih û dira
Demê xanya b'xuha enya xwe çê dikin,
Bîyanî d'bêne xudana,
We bo me yên ava kirîn,
Hilon berin!
Lê d'gel hemî birsatîyê.
Hejarîyê.
Zordarîyê..
Xwe radigrin. Xwe radigrin.

1978

# Dayê

Pîrê dayê
L 'xwe bizivrre û kovan û jana vehêre.
Ma nuzanî ya îroke dirusbûna,
Birîn û rûdan pêr e.
Hilo, hilo j'îro pê ve.
Çîroka karvanê b'rê ve.
Bo tev zaroka vegêrre...
Her vegêrre...

1978


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Ya ez dizanim

Ho şirînê
Te divêtin behsî cîhana îroke,
Bo te bikim!
Ka çi derçû, behsî modelên nû bikim!
We diyare tu nuzanî
Min hay j 'van gotina nîne!
Were, were, bo te bêjim
Ka çend zaro d'landika da
D'êne kujtin!
Ka çend sêdare d'ên danan
Û çend mirov pêve d'êne hilawîstin!
Ka çend gundên tijî hejar,
Her roj d'êne
Vebrandin û wêran kirin!
Erê, erê, ez van d'zanim.
Lewra xemxorê heman im.
Lê min l'bere
Tev gorra j'bo perrêstinê
Ez bi kime mizgeft û dêr.
Hemî gundên wêran kirî,
Bikim bajar. Bikim bajar…

1978

## Fener

Cerdevan û kirêgirtîyên bajarî.
L 'şeva tarî.
Tev fenera
L'torîna min
D'vemirîmin.
Lêva d'mêjin, ber sîngî lê d'pirrtînin.
Lê nuzanin
Min ew lêv yên jehirkirîn,
Dê pê mirin.
Min tev fener yên helkirîn,
Ew gurrîyê j'erdî d'girin.
Navemirin. Navemirin.

1978


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Nobedarê meh û salê

Bo raperînên miletê Felistîne yê xweragir

Felistînê
Ay li min û vî agirî,
Ay li te wê kûrbirînê.
Piştî ezyet û lêdana; ya fer ew e her b'azirî.
Alay nedanî helgirî.
Bawer bike û şoreşgerên te dizanin
Ger nobedarê şevê bî
Yê şev û meh û salê me!
Ger birîndarê gullê bî
Ez hogirê
Eş axînk û kulê me!
Ger asmanê te tarî bît
Yê min l'tarîyê top dibarin!
Ger rûbarê şenge jîna te şêlî bît
Yê min pirrî dirrinde, neheng û mar in!
Ger 1 'paryê keda te har in
Parî û tev hîvî l'min xwarin!
Zarokên min di bê war in.
Gişt zordar û kirêgirtîyên cîhanê
L 'min neyar in..
Lê tev milet û bindest û azadîxaz l'min heval in..
Evca hevala dilbirîn.
Dibên çira 1i me û 1i te jî vemirîn!
Nexêr, nexêr nevemirîn.
Bi sedhezaran me şehîdên
Di vê rê da gorî kirîn.
Şoreşger ala helgirin,
Kî dibêtin em dê revîn!

L ‘hemî tengavîya dibêjîn,
Dê serkevîn û pêşkevîn.
Dê serkevîn û pêşkevîn.

1979

## Dibên narê

Dibên narê, gişt şaira
Xwedan kovan û agira
Şoxên şeng û şepal he ne
Me jî axînk j'dûrîya te ne
Tu yî dermanê dilê jar.
Tu yî xweşkey,
Vî welatê hişk û beyar.
Sewdaser im.
Ez nuzanim,
Çima hosan tu dûr d'kevî û
Tu b'sîlava dilê min da,
Naêye xwar?
Were bes e, te birînên min pîr kirin,
Ne silavek digehîtê,
Ne carek lê dibî nojdar!
Were hey nar.
Şeva min çerxek dirêj e û
Birînênn min pirr in
Qet naêne hejmar!
Tu dibêjî min j'bîr bike,
(Lê nuzanim, çewan rihên evîna te,
Dê ji kûratya dilê xwe rakêşmeder.) *
Tu dibêjî û ez nuzanim.
Ez nuzanim.

(*) Ji helbesteka Nezar Qebanî wergirtî ye.

## Têhniya jê ra nemay av

Narîna min were cana têkda gulav.
Şeng û şirîn, bejin zirav.
Têhnîyê dîtina te me,
Mîna mirovê l'biyabanê berzebûy,
Qirrqiçî û jê ra nemay av.
Wek girtîyê zindaneka,
Teng û tarî
B'dehan sala, ne ronahya fnerê lê bûye mevan,
Ne jî hetav.
Wek zarokê gundê he yê wêran kirî,
Girya wî tê, ka day û bav? !
Were ey yar.
Xemên eve evînîyê û xerîbîyê,
Dilê min xwar.
Berovajî vê cîhana her lê buhar,
Ez yê 1 'hîvyê
Roj biçît û şev zû bête,
Vî cihê xirr bûye şînwar .
Yê pirrî jar.
Belku her mabît ev şeve !
Can minê ko bêye ve.
Ne peyveka şirîn dibêy!
Ne carekê narîne l'pey
Qêrî û nalîna min diêy!
Her dibêm ax, kengî dê êy?
Kengî dê êy?

1981

## Tenyayî

Tu dizanî hindî bêjî
Hej te dikim.
Qet nikarim, te j'bir bikim.
Lê hevalê
Bawer bike hinde cara,
Demê kovan min gej dikin.
Axînk laşê min têr dikin.
Hizir dikem, te l'bir bikem.
Helametê hemî şevê,
Ez d'perrêsim
Bişkênim û senûbin kim.
Tif keme jîna ho bûrî û
Te b'hêlim û evînîyê binax bikim.
Evca were,
Min j ' tenyayê rizgar bike.
Birînên min nojdar bike.
Tu dizanî, min dil bû te,
Parrastîye j'tev nehenga.
Min bo te war ,
Xemlandîye j'bo ahenga.
Were. Were
Barê xema bes b'gêrîne!
Bes kovan û jana heval,
L 'min bicemîne!
J 'min b'revîne.
J 'min b'revîne.

1982

## Dihî dihî

Dihî, dihî.
Te dilê min wêran kir û
L'şenge jîna min kir behî.
Lew xebata dijwar dikim,
Da rojeka geş bêtin û,
Bibim lihî.
Ger bûm lihî.
Dê êm û te rateqînim,
Ji vî cihî.. Ji vî cilî.

1982


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Hejarîno

Ey hejarên vî welatê
Pirr dirrinde û çi gundek lê,
Nemay ava
Sedan sal e û taku niha,
Rojê b'dehan binax dibin,
J 'pîr û genc û keç û sava.
Ne dijminên we d'rawestin,
Ne hûn d'karin xwe rizgar kin,
J 'tor û dava!
Hejarîno
Koçerên bê wargeh û kon!
Vî dijminî deşt û zozan wêran kirin,
Dê kî ve zaroka hajon!
Dawîya çerxê bîstê ye û heşta,
Jin û dayekên we, ji axan ra,
Nanî d'pêjin, cilka dişon!
Heşta keda destên hewe,
Derebeg û axa dixon!
Hejarîno
Heta gengî, dê xanîya ava kin û,
Qet nagehin tê da rûnin!
Qurbanîya den û dê her
Hejar mînin!
Rêke b'bînin!
Şax u daxên welatê me,
B'hizir û bîrên,
Rast û dirust bixemlînin.
Bawer bikin,
Paşeroja geş bo we ye,
Dê her bînin.
Dê her bînin.

1983

## Kî dibêt mirî

L 'vî bajarî
Ne kew awazekê d'bêtin!
Ne ji layê genc û xurta,
Dengê stiranekê d'êtin!
Ne zaro yarîya dikin!
Ne zerîyên şeng û ciwan,
Kezî û biska divehînin,
Ne jî şe d'kin!
Ev çi dem e
Metîn yê pirr mij û tem e!
Sîlav û rûbar û kanî jî dipeyvin,
Hewar eve çi sitem e!
Tênagehim gelo çima,
Ev bajare hind bi xem e!
Lê deng hat û axînk pê ra.
Dol u çîya lê vegêra...
D'van roja da, dinya hejya
Stêreka geş ji smanê,
Torê kurdî, ket û rijya
D'van roja da,
Heval Vehêlî wexer kir.
Tijî cerg û hinavên tev welatîya,
Kul û xem kir .
Guhişî bûm. Dilê min sot u kuzirî.
Ey şairê hemî dema,
Şemalka jînê helkirî.
Kî d'bêt mirî?
Bawer bike, ew mirovê,
J 'rastîya ra, çepera
J 'sîngê xwe çe kit,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qet namirît.
(Ye xwe d'sojît, da rêka yên dî rohin bikit)
Yên dî d'nizm in,
Bes ew e l'esmanî d' firrît.
Yê berperê dîroka wî,
Spî û paqij bît namirît.
Lewra heval,
Navê te jî, d'nexşeya vî welatî da,
Hate çandin.
Helbestên te,
Ne d'ên dizîn, ne firotin.
D'kûratîya tev dila da,
D'êne gotin.
Evca çewa, dê bên mirî!
Tu sax î û her yê hazir î.
Qet namirî…
Qet namirî…

1982